# Efrîn di bin dagîrkeriyê de (302):

## Pirojeyin niştecîkirinê yen nû, kuştina xortekî, girtinine bêsûcane, revîna malbata pakrewanekî, hilweşandina du malên malbatên Êzdî, "Feyleq El'şam" malmewdanina li Cindirêsê zep dike, vêrgiyên "Mihemed El'fatêh", şewatek li daristana "Kela", tundûtûjiya/tundrewiya olî/çalakî û avakirina mizgeftan

Çend alavên ragîhandinî yên Xelîcî/Kendavî li 20 î Rezbera/Êlûna îsal nûçak anîn zimên, ku "**Navenda Melêk/Qeral Selman a Fîxanî û Karên Mirovahiyê**" ya "Erebistana Si'ûdiyê", bi riya hevgîhandineke dîtyarî, ligel "dezgeheke civakî ye sivîl", li ser pirogrameke cîbicîker îmeze kir, ji bo peydakirina "/300/yekîneyên nişteyî yên demkî ji ziyandîtiyên erdhejê re, yên li Çadirgehên "El'bereke, Mislim û Aye" li Herêma Cindirêsê - Parêzgeha Heleb a Sûrî, û /300/malbat -yanê /1330/ kes- jê sûdê werdigirin".




Û Rêxistina "Afad" (Desteya Xişimûbêtar û awerteyan a Turkiyê), bi piştgiriya diravî ji "Navendê" ve, li Havîna sala 2023an. Z, Gundê "**El'xozame**" li nêzîk Gundê "Xezîwê" - Şêrewa/Efrîn (ê ku ji /1500/yekîneyên niştekirinê/Kerevan û tevî toreya elektirîkê û ava vexwarinê, dibistan, mizgeft, dermankiringeh, binsaziyên civakî, rê û ronîkirina kolanan pêk tê) cîbicî kir.



Ton pirojeyên weha xizmet pilanên Turkiyê di avakirina gundên niştecîkirinê de dikin, ji bo guhertina endeza demografî ji herêmê re, û tev jî di bin nixuma pirojeyin bi navine mirovahî yan olî de, û bi riya bi sedan ji rêxistin û toreyên olî!

**Ev jî hin bûyîn li ser rewşên serwerkirî ne:**

**= Kuştina xortekî ji Gundê "Astêr":**

Di siya geregoşiya hilgirtin, bikaranîn û bazirganiya çekan de, li Êvara Sêşemê 25.09.2024an. Z, û li dema hebûna wî li pêş nivîsgeha xalê xwe ya bazirganiya makînan/otombîlan li Kolana "Vêlat" - Bajarê Efrînê, Xort "**Mistefa Nûrî El'nasêr** /24/sal" ji Malbata "Erne"/Êla Umêrat - Gundê "Astêr"/Bakur Rojavayê bajêr rastî qurşînekê hat, û di cî de mir, ew qurşîn jî ji aliyê kesekî ji Gundewarê Heleb ê Rojava ve hate avêtin, ji pêş dîkana bazirganiya çekan a li nik nivîsgehê.

Were bîranîn jî ku malbata xort "Mistefa" (yê vêguneh hatiye kuştin) li Turkiyê dijî, û ew ji berî çend heyvan zorane hatibû derkirin/barkirin.




**= Girtinine bêsûcane:**

- Li 25.08.2024an. Z, Milîseyên "Asayêşa Leşkerî" Hemwelatî "**Qehreman Mistefa Hesen** /50/sal" ji xelkê Gundê "Miskê", bi tewanbariya têkildariyê bi Rêvebiriya Xweser(RX) a berê re girt, piştî vegera wî ji Heleb/ciyê penaberiyê bi heftakê, û lêvegera wî ji biryargeha wan milîseyan re li Bajarê Cindirêsê, ji bo dûzankirin û duristkirina rewşa xwe; Û paşê jî bo Hepsa "Maratê" ya navendî li Bajarê Efrînê hate rêkirin, û li 23.09.2024an. Z dadgehê ew berda, piştî ferzkirina baceyeke diravî li ser.

Û berê jî li destpêka vê heyvê, Istîxbaratên Turkiyê û "Asayêşa Leşkerî" ji heman gundî ev hemwelatî "**Mihemed Henan Sîdo** /37/sal" û "**Hisên Ehmed Ebdela** /37/sal, **Elî Mihemed Mengawî** /36/sal" - ji pêkhateya Ereb girtin, bi tuhmeta têkildariyê bi (RX) a berê re, û ta niha bêsûcane bendkirî ne, bi ser ku ew berê jî bêtirî carekê hatibûn girtin.

- Li 23.09.2024an. Z, Milîseyên "Asayêşa Reco" Hemwelatî "**Mihemed Heyder Ibrahîm** /70/sal" ji xelkê Bajaroka "Be'idîna" girt, bi behaneya ku wî di parêziyeke şevayî de, li dema (RX) a berê du katan pişikdarî kiriye, ya ku şeş sal û nîv di ser dawîkirina wê re derbas bûne; Û piştî du rojan ew berda, piştî ferzkirina dadgehê baceya /500/Dolar Emrîkî li ser, bi mercê ku di rûniştineke din e dadgehê de, bi ferzkirina /300/Dolar din bê tewawkirin.

**= Malbata Pakrewanê Ciwan "Ehmed Xalêd Me'imo":**

Piştî çend heyvan ji tewana kuştina ciwanê Kurd ê negîhayî "**Ehmed Xalêd Me'imo/Malbata Medê**/16/sal", li 13.03.2024an. Z, li Bajarê Cindirêsê, ji aliyê Kujer"Yamên Ehmed Ibrahîm" ve, yê ji Navça Sincarê - Parêzgeha Idlibê û nêzîk ji Milîseyên "Nûr El'dîn Zenkî" ve, malbata pakrewanê ciwan neçar bû bireve û zorane koçberî Ewropa bibe, di bin zext û fişara gefguran de, û ji tirsa li ser jiyana xwe re.

**= Hilweşandina du malan li Gundê "Qîbarê":**

Milîseyên "Feyleq El'rehman" ên ku "**Ebid El'nasêr Şimêr**" (ê ji Xota Rojhilat - Gundewarê Şamê) serkêşiya wan dike, di navboriya rojên borî de, du mal li Gundê "Qîbarê"/ Bakur Rojhilatê Bajarê Efrînê -yê ku piraniya nişteciyên wê Kurdên Êzdî ne- hilweşandin, û ta niha bermayan diguhêse, bê xuyakirina sedeman, û bê ku yek red bike yan jî bipirse.




Were zanîn ku herdu mal ji sala 2018an. Z ve desteserkirî ne, û ew yên du Malbatên Êzdî ne (malbata Pakrewan "**Umer Memo Şemo** - temen bêtirî/66/salan" yê ku li 10.05.2018an. Z termê wî di malê de bi qurşînê kuştî hatiye dîtin, ji aliyê milîseyên ku wê wextê gund basmîş kirine ve, û malbata Hemwelatî "**Sebrî Hemo Nasêr**"), û herdu malbat li piştî dagîrkirina herêmê sala 2018an. Z zorane koçberî Ewropa bûn.

Bi bîr were jî ku Milîseyên "Firqit El'mu'itesêm" û "Feyleq El'rehman" bi hev re deserkirina gund parve dikin, û dest dîdinin ser /110/ malan ji reseniya/300/mal (tevahiya gund), û weha jî li ser zeviyine zeytûna, erdine çandiniyê, stasyoneke sûtemeniyê û guvêşgeheke zeytûna û hin tiştên din; Û îsal "Firqit El'mu'itesêm" hemî rêdankên/wekaletên ku yên li gund mane pê malmewdanên merivên xwe yên ne li wir bi rêve dibirin baykot kirin, û dest danîn ser wan malmewdanan, da ku her hiktarekê ji erdên çandiniyê bi /500/Dolar Emrîkî bi kirê bidin, û werza zeviyên darên biber jî bi demane bidin kesên ku dixwazin, bê ku guh bidin lêçûn û xizmetguzariyên çandiniyê yên berê.

**= "Feyleq El'şam" malmewdanên Malbata "Me'imo" zep dike:**

Me di rapora xwe nimre /286/ dîrok 04.05.2024an. Z de, li ser destdanîna Milîseyên "**Feyleq El'şam**" yên Ixwanî û serkêşên wan li ser malmewdanine Malbata "**Me'imo**" - Başûrê Bajarê Cindirêsê bi hûrgilî nivîsandibû, û bi ser hemî hewildanên zaroyên malbatê ji bo vegerandina malmewdanên xwe bi riya dadgehên Dagîrkeriya Turkiyê û navbênciyan, ew tê de bi ser neketin, û hîna serkêşên "Feyleqê" di pirojeyên xwe de destdirêjiyan dikin, û wan dîwarek yekser li dor /3/donim erd li Rojhilatê Girê Cindirêsê yê kevneşopî avakirin, û jêdereke xwecihî mêldar dike ku armanc ji wê, kolandin û lêgerîna li kevneşop  û kinzên binerd û dizîna wan e.



**= Vêrgiyên "El'sultan Mihemed El'fatêh":**

Ji berî hatina werza/mûsima zeytûna, Milîseyên "Tîpa/Firqit El'sultan Mihemed El'fatêh" (ên ku "**Doxan Silêman** - ê Turkman" serkêşiya wan dike), xelkê Gundên "Hebo, Sariya, Şeytana" - Navça Mabeta, bi riya berpirsiyarê xwe "**Ebo Bîlal**" agahdar kirin, ku rêdankên/wekaletên ku xelkên wan gundan ên li wir pê malmewdanên merivên xwe yên ne li wir bi rêve dibirin hatin baykotkirin, û destdanîna xwe jî ji wan malmewdanan re ragîhand, û ewê werzê jî bifroşin kesên dixwazin, bê ku tu guhdanê bidin lêçûn û xizmetguzariyên zeviyên zeytûna yên du salane.




Û herweha jî çadirin ji bo payandina zeviyên zeytûna ji dizînan venan - li gor gotina wan, da ku rê li ber ferzkirina vêrgiyine din li ser malmewdanên xelkên wan gundan ên li wir vekin, di heman dema ku hemî diz ji endamên wan û anîndeyên ji wan ve nêzîk in.

Û weha jî ji bo werza îsal, xelkên Gundên "Birîmce, Hecqasma, Misteşûra" - Navça Mabeta û "Tirmûşa" - Navça Şiyê bi ferzkirina /3/Dolar Emrîkî li ser her dareke zeytûna (mezin an biçûk, girtî yan negirtî) ji malmewdanên hemwelatiyên li derve agahdar kirin.

**= Ferekirina Gundê "Besme" yê niştecîkirinê:**

Li 17.09.2024an. Z, Komela "**Destên Sipî**" berdewambûna avakirina yekîneyên nişteyî yên nû li Gundê "**Besme**" yê niştecîkirinê li Başûrê Gundê "Şadêrê" - Şêrewa ragîhand.




Û berê jî "Komelê" li 09.09.2023an. Z belav kiribû, ku wê avakirina /30 yekîneyên nişteyî=360 perçemal/ ji destpêka avakirina Gundê "Besme" ve bi dawî kiriye; Û li 10.03.2024an. Z jî, wê vekirina /80/perçemalî/şiqeyî li heman pirojeyê, û bi pereyên "Komela Jiyankirina Birûmet/El'eyş Bîkeramê - Felestîn /48/" (ya ku hesabekî xwe li ba Banka "Hapo'alîm" a Isra'îlî ji bo komkirina alîkariyan vekiriye) ragîhand.

**= Şewatên daristanan:**

Li Roja Pêncşemê 26.09.2024an. Z, agirin bi daristaneke îhracê li nêzîk Gundê "**Kela**" - Navça Şiyê hatin xistin, û "Berevaniya Sivîl a Sûrî" tekez kir, ku tîpên wê şewat dorpêç kir û ji derdorê cuda kir, ji ber çetiniya gîhîştina aletên vemirandinê ji cihê wê re, bi sedema asêbûna herêmê, û rûbera wê jî dora/5/hiktaran e; Û ji wêneyên belavkirî kokên darên mezin ên berê qutkirî û bermayên hişk xuya dibin.






**= Tundrewiya olî:**

Ji sala 2018an. Z ve, danesereke/hemleyeke fere û berdewam ji bo belavkirina raman û kiryarên olî yên Islamî û tundûtûj re li herêmê heye, û li gor pilaneke pîvayî, bi serpereştî, şîret û piştgiriya dezgehên (Sekna Diyanet a Turkî, Serokatiya Warên Olî ya Turkî) û bi pereyên hevbeş bi rêxistinên "Rêxistina Birayên Misilman/Ixwan El'muslimîn a Cîhanî" re; Û bi ser zêdekirina dersên olî di dibistanan de, û vekirina dibistanên olî yên pispor (Îmam Xetîb, El'sefa, Gupikên Bihiştê/Bera'êm El'cene...), kadroyên olî (mamoste, îmamên mizgeftan, gotarbêj/xutabî...) bi gelek çalakî û korsan di mizgeft, dibistan û gulîstanxaneyên zarokan û hin din de radibin, û herweha jî tevgera avakirina mizgeftan di her gundekî, komelgeheke nişteyî û taxekê de berdewam dike, jê:

**-** Li 17.08.2024an. Z, vekirina Mizgefta "Ebo Bekir El'sidîq" li ser Riya Cindirêsê - Başûr Rojavayê Bajarê Efrînê.




**-** Li 30.08.2024an. Z, vekirina Mizgefta "El'hac Ehmed Ebo Silo" li Gundê "Baliya" - Navça Bilbilê.




**-** Li 12.09.2024an. Z, "Komela Destên Sipî" destpêkirina karên avakirina Mizgefta " El'nûr" li Gundê "El'mezre'e" - Gundewarê Efrînê ragîhand, di çarçewa Pirojeya "Nûr El'hûde ya Avakirina Mizgeftan" de.




**-** Li 24.09. 2024an. Z, vekirina Mizgefta "El'hace Fatîme El'edhemî" li Gundê "Elîbegê" - N. Bilbilê.



Û ew jî bi beşdariya Hevrêzkarê Turkî "Yûsêf Keser" (ê ku bi "Hevrêzkarê Giştî yê Herêma Şaxa Zeytûnê" tê navdan), Rêvebirê "Sekna/Ewqafa Efrînê", û Nûnerên "Encûmena Islamî ya Sûrî - Istanbûl, Artêşa Turkiyê, milîseyan, Hikometa Sûrî ya Demkî" û hinên din.

**Eger rast "Erebistana Si'ûdiyê" ji rewşên mirovahî yên penaberên Sûrî yên hundirîn re li çareseriyan digere, ji dêvla avakirina niştecîgehên ku dikevin xizmet siyaseta Turkiyê a dijberî Kurdan û herêmên wan, û metirsîdar li ser pêşeroja Sûriyê, çêtire ew hewil bide ku wan penaberan vegerîne herêmên wan ên resen, û alîkariyê di avakirina civakên wan ên xwecihî de bike, di pêvajoya vegerandina têkeliyên xwe bi Şamê re.**

28.09.2024. Z – 2636. K

**Nivîsgeha ragihandinê- Efrîn**

**Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê**

--------------------------

**Wêne:**

- Endezyar "Ehmed kurê Elî El'bîz" alîgirê serpereştkarê giştî li ser "Navenda Qeral Selman a Fîxanê û Karên Mirovahiyê" a Erebistana Si'ûdiyê, û çawa li ser pirograma cîbicîkirina gundekî niştecîkirinê li Cindirêsê îmze dike.
- Gundê "El'xozame" yê niştecîkirinê.
- Ciwanê vêguneh hatiye kuştin "Mistefa Nûrî El'nasêr".
- "Ebid El'nasêr Şimêr" - serkêşê Milîseyên "Feyleq El'rehman".
- Avakirina dîwarekî li dora erdekî Malbata "Me'imo", li Rojhilayê Girê Cindirêsê yê kevneşopî, ji aliyê Milîseyên "Feyleq El'şam" ve.
- "Doxan Silêman" - serkêşê Milîseyên "Tîpa/Firqit El'sultan Mihemed El'fatêh".
- Ferekirina Gundê "Besme" yê niştecîkirinê.
- Şewatek li Daristana Gundê "Kela" - N. Şiyê.
- Vekirina Mizgefta "Ebo Bekir El'sidîq" li ser Riya Cindirêsê - Başûr Rojavayê Bajarê Efrînê.
- Vekirina Mizgefta "El'hac Ehmed Ebo Silo" li Gundê "Baliya" - N. Bilbilê.
- Karên Avakirina Mizgefta "El'nûr", ji aliyê Komela "Destên Sipî" ve, li Gundê "El'mezre'e" - Gundewarê Efrînê.
- Vekirina Mizgefta "El'hace Fatîme El'edhemî" li Gundê "Elîbegê" - N. Bilbilê.